hejmar 9 havîn 1991

# KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî


*Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan*
*Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan*

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

# HESP

*Amedekar* : Mizaffer BEGZADE

| kurdî | tirkî | fransizî | ingilîzî |
|---|---|---|---|
| 1-38 hesp | at | morphologie du cheval | points of the horse |
| 1-11 serî | baş | tête (la tête du cheval | head (horse's head) |
| 1- guh | kulak | oreille | ear |
| 2- tûmik, tûncik | perçem | toupet | forelock |
| 3- enî | alın | front | forehead |
| 4- çav | göz | œil | eye |
| 5- rû | yüz | face | face |
| 6- difin, poz, bêvil | burun | chanfrein | nose |
| 7- firnik | burun deliği | naseau | nostril |
| 8- lêva jorî | üst dudak | lèvre supérieure | upper lip |
| 9- dev | ağız | bouche | mouth |
| 10- lêva jêrî | alt dudak | lèvre inférieure | underlip (lower lip) |
| 11- guhişk, alûş, alçîmek | atın alt çenesi | ganache | lower jaw |
| 12- patik | ense | nuque | crest (neck) |
| 13- bijî | yele | crinière | mane (horse'smane) |
| 14- çema stû | | encolure | crest (horse's crest) |
| 15- stû | boyun | cou | neck |
| 16- gewrî | boğaz | gorge | throat |
| 17- sermil | | garrot | withers |



| kurdî | tirkî | fransizî | ingilîzî |
|---|---|---|---|
| 18-27 lingê pêşin,dest | ön ayak | membre antérieur | forehand |
| 18- şepîlk, pol | omuz | épaule | shoulder |
| 19- sîng, pêxîl | göğüs | poitrail | breast |
| 20- binçeng | dirsek | coude | elbow |
| 21- mil | bilek | avant-bras | forearm |
| 22-26 zend | | pied antérieur | forefoot |
| 22- çok | diz | genou | knee (carpus, wrist) |
| 23- zend | | canon | cannon |
| 24- qevdik, xirtik | | boulet | fetlock |
| 25- gûzek | bukağılık | paturon | pastern |
| 26- sim | | pied (sabot) | hoof |
| 27- goçke | | châtaigne, un durillon | chestnut (castor), a callosity |
| 28- demara mehmûzê | | veine thoracique externe | spur vein |
| 29- navpişt | sırt | dos | back |
| 30- masulka, piş | | reins | loins (lumbar region) |
| 31- qorik | sağrı | croupe | croup (rump, crupper) |
| 32 - kulîmek | kalça | hanche | hip |
| 33-37 - lingê paşî | arka ayak | membre postérieur | hind leg |
| 33- çok | | grasset | stifle (stifle joint) |
| 34- qurma dêlê | but | attache de la queue | root (dock) of the tail |

## CIVÎNA BIHARA 1991AN

Civîna nehemîn a li ser zimanê kurdî, zaravayê kurmancî ji 25ê gulanê ta 1ê hezîranê, li Swêdê, li xwendegeha Biskops Arnöyê civiya. Civîn giraniya xebatên xwe da ser lêgerîna peyvên hin afirandinên klasîk û nûjên ên kurmanci : *Nûbara Ehmedê Xanî* (Sedsala XVIIan), *Adet û Rusûmatê El Ekrad* (Sedsala XIXan), Memê Alan, Dîwana Duwem a Cegerxwîn, kovarên *Roja Nû* û *Stêrk* (Salên 1940an), Dîwana Tîrêj. Tevî vê lêkolîna bingehîn ji bo vejîndina dewlemendiyên kêmnas ên zimanê me beşdarên civînê li ser hin gotinên jiyana rojane (hesp û mirîşk) û li ser pirsên rêzimana kurdî jî xebitîn. Em encamên van xebatan di vê hejmarê de belav dikin. Hevalên ku beşdarî civîna bihara 1991an bûn, ev in : Lutfî Baksi (Xerza), Rojen Barnas (Diyarbekir), Mizaffer Begzade (Şikakan), Huseyin Kurdo (Amûd), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Mêrdîn), Elî Şêr (Wan), Mehmet Uzun (Siwêrek), Veysi Zeydanlî (Bedlîs), Zeynelabidîn Zinar (Batman) û Reşo Zîlan (Agirî).

KURMANCÎ

## LI SER RASTNIVÎSÎNA ÇEND TIŞTAN

(II)

*Reşo ZÎLAN*

### 3. Rastnivîsîna pirtikên bi *bê* û *ne* -yê

Di zaravayê kurmancî de daçeka «**bi**»-yê xwedî çend maneyan e. Wek daçekekê maneya wê ya bingehîn tev, tevî, di gel, pê re, pêrebûn û refaqetkirin e.Bi alîkariya vê daçekê çend daçekên hevedudanî jî tên saz kirin, ku di pêkhatinên weha de rola «**bi**»-yê pêşdaçek e. Ev pêşdaçek çu caran bi peyva berî xwe yan jî bi dû xwe ve nayê zeliqandin. Ew hertim serbixwe û cihê tête nivîsîn. Paşdaçekên ku daçekên hevedudanî pêk tînin jî, ku «**de**, **re**, **ve**» ne, divê wek «**bi**»-yê cihê û serbixwe bêne nivîsîn.

Ev çend nimûne ne ji bo daçekên sade:

*Tu hîna* ***bi*** *kurdî nizanî!*
*Balafira me hê* ***bi*** *hewayê neketiye.*
*Ewî pere* ***bi*** *bêrîka xwe xist.*
***Bi*** *min, ev ne tiştekî qenc e.*
*Tu* ***bi*** *ya min bike, guh mede xelqê.*
*Mendoyê bêbext ew* ***bi*** *kuştin da.*
*Ez* ***bi*** *şivan bûm.*

Ev jî çend nimûne ne ji bo daçekên hevedudanî:

*Mêvan dê* ***berbi*** *êvarê bêne malê.*
*Karwan* ***ber bi*** *destê sibehê derkete rê.*
*Devê şûşê* ***serbi*** *jêr meke, ser****bi*** *jor bike!*
*Ne ku ez, lê* ***biser de*** *ew ji me dixeyîde.*
*Ji duhî* ***û bi virde*** *ez di nivînan de me.*
*Kinc û solên min* ***bi*** *avê* ***de*** *çûn.*
*Min dît, ku hin serbaz* ***ber bi*** *gund* ***ve*** *diçûn.*
*Tiştekî* ***bi*** *ser* ***ve*** *zêde meke!*
*"Axa,* ***bi*** *deh gundiyên xwe* ***ve****, bawer dike ku Keyxosrow e".*
*Şagirt* ***bi*** *mamoste* ***re*** *çûn çolê.*
*Nasnameya wî ne* ***bi*** *wî* ***re*** *bû.*
***Bi*** *derenceyan* ***re*** *hilkişiya taqa didiwan.*

Herweha **bi** dikare rola forma alaviyê (enstrûmental) jî, ango çêkirin yan jî bûna tiştekî bi riya yan jî bi alîkariya alav û amrazekî (alet, hacet, enstrûment), bîne cîh. Bo nimûne:

*Ez çayê* ***bi*** *şekir vedixwim.*
*Ajda* ***bi*** *otomobîlê diçe çarşiyê.*
*Hestî* ***bi*** *kêrê nayên hûr kirin.*
*Wî destên xwe* ***bi*** *sabûnê şûştin.*
*Cendirme dixwazin me* ***bi*** *darê zorê bînin rê.*
*Dîwarên odeyê* ***bi*** *keviran hatine çêkirin.*
*Welat navê xwe* ***bi*** *qelemê nivîsand.*
*Wî* ***bi*** *galegalê serê me bir.*
*Pirto* ***bi*** *destê Nevzad hat kuştin.*
*Min ew pere* ***bi*** *destên xwe spartin wî.*
*"Yek heye,* ***bi*** *sedî; sed heye,* ***bi*** *yekî".*
*"Dinya* ***bi*** *dor e, ne* ***bi*** *zor e".*

*Ka de tu* ***bi*** *navê Xwedê sond bixwe!*

Ji bilî vê, **bi** dikare bibe hoker jî. Heke **bi** bi rola hokerê rabe jî divê ew bi tena serê xwe bête nivîsîn. Heçî **bi**-ya hoker e, ew ji bo darîçavkirina çawan û herweha kînga, di çi zemanî de qewimîna bûyerekê ye. Wek:

*Wê* ***bi*** *dizîka ji kurê xwe re got.*
***Bi*** *rastî ez ne di wê baweriyê de me.*
***Bi*** *roj ba dihat,* ***bi*** *şev jî baran.*
*Zimanê wî roj* ***bi*** *roj qelstir dibe.*
*Wî* ***bi*** *temamî dest ji kurdîniyê berdaye.*
*Ez ê ji te re* ***bi*** *tenê gotinekê bibêjim.*
*Hevind* ***bi*** *vî awayî nikare bixwîne.*
*Ez ê ne* ***bi*** *siwarî, lê* ***bi*** *peyatî bêm.*
*Tu* ***bi*** *qencî jê re bibêje, ne* ***bi*** *xerabî.*
*Hevraz her* ***bi*** *carekê derew dikirin.*
*Em* ***bi*** *saetan li benda te man.*

Herwekî ku di hevokên jorîn de jî diyar dibin, rola **bi**-yê, ji bilî ku ew hoker e, temamkera lêkerê (verbal attribut) ye jî. Ango **bi**, naveroka hevokê bi alîkariya lêkeran temam dike. Gava ku em li hevoka *Wê bi dizîka ji kurê xwe re got* dinihêrin, em dibînin ku di vê hevokê de peyva *bi dizîka* bi rola hokerê radibe. Ew bi me nîşan dide, ku diya wî kurikî bi çi awayî, bi çi rengî bi kurê xwe re peyiviye. Heke em pirsa *Wê çawan ji kurê xwe re got?* ji hevokê bikin, dê bersiva pirsa me *bi dizîka* be. Ne xwe, *bi dizîka* hoker e. Lê belê, pirtika ku di vê hevokê de lêkerê temam dike, **bi** ye. Bêî bikaranîna **bi** -yê, em nikarin lêkera di vê hevokê de, ku *got* e, temam bikin. Ji lewre jî em jê re dibêjin ev **bi**, temamkera lêkerê ye. Ji ber vê yekê jî divê ev **bi** bi tena serê xwe bête nivîsandin.

Carina jî **bi** bi rola pêşpirtikê radibe û di forma îzafeyê de tête bi kar anîn. Di rewşên holê de, divê em **bi**-yê ji peyva ku bi dû wê re têt, veneqetînin û wan bi hev re binivîsin. Wek:

*Xwarina* ***bi*** *rûn dijminê tenduristiya me ye.*
*Kebaniya* ***bi*** *zarok xwe vedihisîne.*
*Heval mirovekî* ***bi*** *bext e.*
*Ev bizina me heywanekî* ***bi*** *goşt e.*
*Ciwan goştê* ***bi*** *bez hez nedikir.*
*Destgirtiya wî yeke* ***bi*** *naz e.*
*Hêmîn xwarinên* ***bi*** *tam çêdike.*
*Xortên* ***bi*** *kezeb ji gundê me derketine.*
*Geliyên* ***bi*** *dar xemla welêt in.*

Wek xuya ye, di nimûneyên jorîn de rola **bi** -yê pêşpirtik e. Ew hatiye pêşiya peyvekê, jê rengdêreke nû afirandiye. Ev rengdêra nû jî bûye temamkera navdêrekê yan jî bernavekê. Divê bête gotin, ku rengdêrên weha çêkirî, gelek caran îdyomên nû pêk tînin û ji aliyê naverokê ve, maneyeke nû diafirînin. Herwisan, **bi** -yên pêşpirtik yên bi vî rengî, pirî caran maneya *heyî, heye, xwedî/xwedan* yan jî maneya paşpirtika *-dar* didin naveroka peyva di gel xwe. Ango: Birûn = rûndar, rûnheyî.
Bizarok = ducanî.
Bibext = xwedîbext.
Bigoşt = goştdar, goştheyî.
Bibez = bezdar, bidon, birûn.
Binaz = nazdar.
Bitam = tamdar, biçêj, çêjdar.
Bikezeb = wêrek, mêrxwas.
Bidar = dar lê heye.

Tiştên ku me di warê rastnivîsîna **bi** -yê de gotin, bi giştî, di warê rastnivîsîna **bê** -yê de jî derbas dibin. Ji ber ku ferqa di navbera **bi** û **bê** -yê de, bi tenê ji aliyê naverok û maneyê ve ye. Ne ku ji aliyê rêzimanî ve. Ji aliyê rêzimanî ve rola herdukan jî yek e. Lê belê, herwekî tête zanîn, ew ji aliyê mane û naverokê ve du pirtikên bervajiyên hev in. Heçî **bê** ye, ew di maneya tunebûn, pêrenebûn û hwd de ye. Ew ji peyva *bêyî* hatiye kurt kirin û bûye **bê**. Car caran dibe **bêî** jî. Ew, nemaze gava ku di gel gehîneka *ku*, yan jî bi tena serê xwe di maneya hayjêtunebûn, tunebûn û bihevrenebûnê de tête bi kar anîn, dibe **bêî**.

Ev in çend nimûne ji bo rastnivîsîna **bê** -yê.
Ne bi hev re:

*Ez çayê* ***bê*** *şekir vedixwim.*
***Bê*** *guman ev tiştên te gotî, rast in.*
*Duhî ez* ***bê*** *pere çûbûm dikanê.*
*Goşt* ***bê*** *bez e, ji te re baş e.*
*Wî cînarê xwe* ***bê*** *sebeb bi hêrs kir.*
*Ez ê qewlê xwe* ***bê*** *gotin bînim cîh.*
*Çi bikim,* ***bê*** *bext im, şansê min tune ye!*

Bi hev re:

*Koçer mirovekî* ***bê*** *bext e.*
*Dibêjin ew bi derdekî* ***bê*** *derman ketiye.*
*Meyweyên* ***bê*** *tam nayên xwarin.*
*Mirovê* ***bê*** *kar divê li kar bigere!*
*Xwarina* ***bê*** *pere bi destê her kesî nakeve.*
*Penêrê* ***bê*** *îman nedibate xwarin.*
*Ev bîr, bîreke* ***bê*** *binî ye.*
*Cira hevalê te yê* ***bê*** *rû ne xweş e.*
*Tu dê ji kû mirovekî* ***bê*** *deng bibînî?*

Çend nimûne ji bo rastnivîsîna **bêî** -yê:

*Ew* ***bêî*** *min nabe.*
*Êzdîn* ***bêî*** *xanima xwe naçe serdana xelqê.*
*Ew* ***bêî*** *ageha mamosteya xwe derketine hewşê.*
***Bêî*** *ku cînaran bihisîne, mala xwe bar kiriye.*
***Bêî*** *ku tu bizanibî, me pereyên xwe hiltanîn.*

Heçî rastnivîsîna pirtika **ne** -yê ye, qaîdeyên ku ji bo rastnivîsîna **bi** û **bê** -yê derbas dibin, divê ji bo rastnivîsîna pirtika **ne** -yê jî derbas bibin. Berî her tiştî, pirtika **ne** -yê, pirtikeke neyîniyê ye. Ji bo pêkanîna raweya neyîniyê tête bi kar anîn. Me dil nîne, ku em li vir dîsan li ser raweya neyînî û qaîdeyên ku ji bo wê derbas dibin, rawestin. Ji ber ku me li ser vê pirsgirêkê di hejmara 5-an ya KURMANCÎ de, ku di havîna sala 1989-an de hatiye weşandin, bendeke taybetî nivîsîbû. Ji ber vê yekê jî, em ê bi tenê bi kurtî ji **ne** -ya ku mirov bi hev re dinivîse, çêl bikin.

Qaîdeyên ku di warê rastnivîsîna **ne** -yê de derbas dibin, herwekî yên **bi** û **bê** -yê ne. Ango, her çi gava ku rola **ne** -yê bibe temamkera lêkerê, divê ew cihê bête nivîsîn. Lê heke rola **ne** -yê bibe pêşpirtik û ew di gel peyva bi dû xwe re rengdêreke nû yan jî îdyomekê biafirîne, divê ew bi hev re bête nivîsîn. Wek:

Ne bi hev re:

*Heyam niha êdî* ***ne*** *sar e.*
*Eylo* ***ne*** *kurapê min e, lê kurmetê min e.*
*Ew ê ku telefon kiribû,* ***ne*** *ez im.*
*Doktor dibêje ku ew* ***ne*** *kunêr e.*
*Hingê Efrasyab* ***ne*** *rengkorî bû.*
*Mircan* ***ne*** *yara Keleş e, yara Kawe ye.*
*Ew camêrê ku tu dibêjî,* ***ne*** *merd e.*

Bi hev re:

*Miraz ne mirovekî dewlemend e,* ***ne*** *dar e.*
*Zagros* ***ne*** *yarê me hemûyan e.*
*Gelo kîjan doktorî ev* ***ne*** *xweş muayene kiriye?*
*Ewî ne duayên qencan, lê duayên* ***ne*** *qencan kirin!*
*Mem û Zîna Xanî yê* ***ne*** *mir sertaca edebiyata me ye.*
*Camêrên* ***ne*** *merd yên wek te, nehatine rûkalê dinyayê.*
*Mîha me jî û çêleka me jî* ***ne*** *zok in.*
*Kesê* ***ne*** *heq divê cezayê xwe bibîne.*

| | | | |
|---|---|---|---|
| 35- ramê stûr | bacak | cuisse | haunch |
| 36- ranê zirav | dirsek | jambe | gaskin |
| 37- çevok | | jarret (la pointe du jarret) | hock |
| 38- dêl, qemçik, boçik | kuyruk | queue | tail |
| 39-44- meşa hespan | at yürüyüşleri | allures | gaits of the horse |
| 39- qedem, meşa nerm, rêveçûn | yürüyüş | pas | walk |
| 40- rewan | rahvan | amble | pace |
| 41- loq | tırıs | trot | trot |
| 42- gurloq | | galot | canter (hand gallop) |
| 43-44- çargaviya nerm | hafif dörtnala | petit galot | canter |
| 43- çargav, çarnal | dörtnala | galot | gallop |
| 44- çargaviya mişt | hücum dörtnala | grand galot | full gallop |
| temen, emr | yaş | âge | age |
| şîre, 1 salî | 1 yaşına kadar | jusqu'à 1 an | less than 1 year old |
| bîrye 2 salî | tay | poulin | foal |
| cohnî, canî | 1 ile 2 yaşları arası | âgé de 1 à 2 ans | between 1 to 2 years old |
| nuhzîn, 3 salî | 2 ile 3 yaşları arası | âgé de 2 à 3 ans | between 2 to 3 years old |
| qute, 4 salî | 3 ile 4 yaşları arası | âgé de 3 à 4 ans | between 3 to 4 years old |
| dêlberdayî, 5 salî, | 4 ile 5 yaşları arası | âgé de 4 à 5 ans | between 4 to 5 years old |
| hesp, ji 5 salî pê ve | at (5 yaşından sonra) | cheval (à partir de 5 ans) | horse (5 years od or more) |

nîşana 5 saliyê ew e ku du diranên pehn hene, dibêjin enaf.
nijdî kirin, di 5 saliyê de ku ji bona hesp dêla xwe baş hilde jor, hinekî ji dêla wê/wî dibirin.

**RENGÊN HESPAN**

| | | | |
|---|---|---|---|
| reşbez | koyu gri | gris foncé | dark grey |
| sorboz | demir kır | aubère | strawberry roan |
| şînboz | çelik grisi | gris bleu | blue grey |
| kumêt | doru | bai, e | bay |
| zerkumet | kule | isabelle | light-tan (horse) |
| qule | sekili at | balzan | (horse) with white stockings |
| qemer | yağız | brun | brown |

# FERHENGOKA ROJA NÛ

Amadekar : Reşo ZÎLAN

| *kurdî* | *tirkî* | *fransizî* | *îngilîzî* |
|---|---|---|---|
| kiryarî | abone ücreti | abonnement | subscription |
| kiryar | abone | abonné (e) | subscriber |
| kiryar (bikir), kirîdar, kiryox | alıcı | client, acheteur | client, buyer |
| bişûndemayîn | gerikalma | arriération | backwardness |
| xwe di ser re zer kirin, xwe di ser ve çeng kirin | aşmak | franchir | to cross |
| navtêdan | kışkırtma, tahrik | provocation, incitation, instigation | provocation, incitement, instigation |
| lêsorkirin, lêtûjkirin | kızıştırma | excitation | excitement |
| bîrewer | aydın | intellectuel | intellectual |
| xweser | bağımsız | independant | independent |
| xweserî | bağımsızlık | indépendance | independance |
| heyîn | varlık | existence | existence |
| bîr birin, bîr lê birin | düşünmek, tahmin etmek, değerlendirmek | penser, évaluer, tenir compte | to think, to evaluate, to take into account |
| lebat, endam | uzuv | membre | member |
| xerabe, kavil, wêran, dêris, xirbe | harabe | ruine | ruin |
| bi dar ve kirin | idam etmek | pendre | to hang |
| yekîne | birlik (askeri) | unité (militaire) | unit (military) |
| bombeavêj, bombavêj | bombardıman uçağı | bombardier | bomber |
| sozwinda | sözünü tutmayan | qui ne tient pas parole | who doesn't keep his word |
| qipçe kirin | kenetlemek | cramponner, attacher | to clamp, to fasten, to tie |
| neqeb | geçit, gedik, ara | passage, brèche | passage, breach, gap |
| mamik, tiştonek, qelpik, têderxistinok | bilmece | devinette | riddle |
| noqav | deniz altı | sous-marin | submarine |
| bin av kirin | batırmak | couler, faire plonger | to sink, to plunge sthg into |
| baskordî | kolordu | corps d'armée | army corps |
| sinçî, sincî | karakter, ahlak | caractère, habitude | character, habit |
| sermed | ebedi | éternel | eternal |
| sermedî | ebediyet | eternité | eternity |
| fermandar | komutan | commandant | commander |
| serfermandar | başkomutan | commandant en chef | commander-in-chief |
| serfermandarî | başkomutanlık | commandement en chef | commandement-in-chief |
| topên balafirşikên | uçaksavar topları | artillerie anti-aérienne | anti-aircaft artillery |
| nûçegihan | muhabir | correspondant | correspondent |
| zirehpûş,zirîpoş | zırhlı | cuirassé | battleship |
| navhincî, navincî | orta büyüklükte | moyen | middle sized |
| ardû | kuru yakacak | combustible solide | solid combustible |
| sotemenî | yakıt | carburant, combustible | fuel |
| tasa şihînê | terazi kefesi | plateau d'une balance | scales pan |
| şihîn, şehîn | terazi | balance | scales |
| penah | barınak | abri | shelter |
| pê dan erdê | direnmek | résister | to resist |
| berfende, aşît, renî, renû, herez, basû, şepe, horyes | çığ | avalanche | avalanche |
| pûn: pûyin, debax kirin | sepilemek | tanner | to tan |
| nav hilanîn | zikr etmek | mentionner | to mention |
| leylan | serap | mirage | mirage |
| seyandin (dûtin) | sıvamak | enduire | to coat |
| bi cezbê ketin | (tarikat ehli için)kendinden geçmek | entrer en transes | to go with a trance |
| cezbe | kendinden geçme | transe, extase | trance, ecstasy |
| serguzeşt | serüven | aventure | adventure |
| komgirav | takımada | archipel | archipelago |
| gehînek | aşama, merhale | étape | stage, stop |

| | | | |
|---|---|---|---|
| serfirazî | zafer | victoire | victory |
| heyman, qelandin,tov birandin | yok etmek | exterminer | to exterminate, to wipe out |
| bijarte, bijare | seçkin, seçilmiş | choisi, distingué | select, distinguished |
| dirêjî.... kirin | saldırmak, hücum etmek | attaquer, assaillir | to attack, to assault |
| sermiyan | başkan, lider | président, chef | president, chief |
| têkilî... bûn | karışmak | intervenir, s'immiscer | to intervence, to interfere |
| çeleng | çevik, cesur, hareketli, yakışıklı | vivant, alerte, agile, beau | alive, alert, agile, lively, beautiful |
| şehreza | becerikli, yetenekli,bilgili | avisé, habile, adroit, talentueux | sensible, skilful, dexterous, skilled, gifted |
| dîdevan | gözcü | surveillant, sentinelle | sentry, watchman |
| dîdevanî | gözcülük | surveillance, garde | watch, surveillance |
| nîkbîn, çakbîn | iyimser | optimiste | optimist |
| nîkbînî, çakbînî | iyimserlik | optimisme | optimism |
| bedbîn | karamsar | pessimiste | pessimist |
| bedbînî | karamsarlık | pessimisme | pessimism |
| armanc | amaç, ereç, hedef | but, objectif, cible | goal, objective, target |
| qad | saha, meydan, alan | terrain, champ, place | ground, field, place |
| qada şer | savaş alanı | champ de bataille | battle-field |
| qada dahatinê | iniş alanı | terrain d'atterrissage | landing ground |
| alan | yankı | écho | echo |
| alan dan | yankılamak | répercuter, produire un écho | to echo |
| bi hewa ketin | havalanmak | prendre l'air, s'envoler | to take off, to fly away |
| nuhirandin | mırıldanarak şarkı söylemek | fredonner | to hum |
| torin | asil, yakışıklı | noble, beau | noble, handsome, beautiful |
| narincî | turuncu | orangé, châtain clair. | chestnut, light biswin, reddish |

sincok : benî, meşlûr, sincûx, kome
kesme : helîl

# F E R H E N G O K A
# Nûbara Ehmedê Xanî

*Amadekar* : Zeynelabidîn ZINAR
Nûbar di sala 1683 an de hatiye nivîsîn.

| **kurdî** | **tirkî** | **fransizî** | **îngilîzî** |
|---|---|---|---|
| gerew, graw | 1) rehin 2) karşılık | 1) gage 2)contre-partie, contre-valeur | 1) pawn 2) compensation |
| ziyan | hasar | dommage, perte | dammage, harmn, loss |
| derew | yalan | mensonge | lie |
| şilîl | çavdar | seigle | rye |
| to | kaymak | crème | cream |
| bet | toy | outarde | bustard, Canada goose |
| zîv | gümüş | argent | silver |
| paxir | bakir | cuivre | cooper |
| risas, zirinc | kurşun | plomb | lead |
| qela | kalay | étain | tin, pewter |
| ejnû | diz | genou | knee |
| sîng | göğüs | poitrine | chest, breast |
| ran | baldır | cuisse | thig |
| didan (diran) | diş | dent | tooth |
| lêv | dudak | lèvre | lip |
| xasma: nexasim, nemaze | özellikle | particulièrement, spécialement | particularly, especially |
| bajar | şehir | ville | city, town |
| dirav | para | monnaie, argent | money |
| ermûş | îpek | soie | silk |

| | | | |
|---|---|---|---|
| mehder | şefaet | intercession | intercession |
| mehdervan | şefaatkar | intercesseur | intercessor |
| rewal: bêmû | tüysüz | imberbe | beardless |
| hilû | pürüzsüz | lisse | smooth |
| biçûk | küçük | petit | small |
| mak | ana, anaç | mère, matrice | mother, matrix |
| asîman | gök | ciel | sky |
| mey | şarab | vin | wine |
| meyxwer | şarapçı | buveur de vin | wine drinker |
| hinarî | gönderilen, elçi | envoyé | envoy |
| bêgav | mecbur | obligé | obliged, complelled |
| bêgavî | mecburiyet | obligation, nécessité | obligation |
| gor | mezar | tombe | grave |
| hinar | nar | grenade | pomegranate |
| gilyaz | kiraz | cerise | cherry |
| hejîr | incir | figue | fig |
| kuncî | susam | sésame | sesame |
| bih | ayva | coing | quince |
| kundir | kabak | courge | marrow, squash |
| penîr | peynir | fromage | cheese |
| poxîn: genimê qelandî û hûrkirî | kavut | blé frit | fried wheat |
| keşk: çortan | kurut | grumeaux de babeur sechés pour l'hiver | buttermilk lump dried for winter |
| heban | dağarcık | sacoche | food bag |
| girr, debax | tabak | tannage | tanning |
| hevrê | yoldaş | compagnon, camarade | companion, mate |
| pîşe | meslek | métier, profession | occupation, craft, profession |
| kevan | yay | arc | bow |
| kêşik | yay kirişi | corde d'un arc | bow's string |
| tîr | ok | flèche | arrow |
| leşker | asker | soldat | soldier |
| cuwamêrî | cömertlik | générosité | generoisity |
| nijde | devriye | patrouille | patrol |
| mêrînî | mürüvet | magnanimité, générosité | magnanimity, generosity |
| lawînî | gençlik | jeunesse | youth |
| pêşû | sivrisinek | moustique | mosquito |
| pojan | yavşan otu | véronique | speedwell, veronica |
| pûng | yarpuz | menthe sauvage | wild mint |
| superng (siping) | yemlik otu | salsifis des prés | goats beard |
| kaxez | kağıt | papier | paper |
| penbû | pamuk | coton | cotton |
| bêheya | hayasız | effronté | shameless, impudent |
| riswayî | rezil | infâme, vil | vile, infamous |
| evîn | aşk, sevgi | amour | love |
| yar | dost | ami,e | lover |
| kewden | görgüsüz, cahil, düşüncesiz | écervelé, idiot rustre, goujat | churl, loot, boor co-spouse |
| hewî | kuma | co-épouse, lien de parenté entre les épouses d'un polygamme | |
| têkil | karışık | mélangé, embrouillé, désordonné | mixed-up, muddled, disorderly |
| ask | geyik | cerf | stag, hart |
| bîşe | çalılık | bosquet, buisson | copse, grove |
| bardar | yüklü | chargée, enceinte | loaded, laden, pregnant |
| avis | hamile | grosse, enceinte | pregnant |
| mafûr | halı | tapis | rug, carpet |

| | | | |
|---|---|---|---|
| mey | şarab | vin | wine |
| hêvî | umut | espoir | hope |
| hêvînemayî | umutsuz | désespéré | hopeless |
| asin | demir | fer | iron |
| pola | çelik | acier | steel |
| biraştî | izgara, şiş ya da ya da fırında pişmiş | rôti | roast |
| ta | tel | fil | thread, wire |
| taze | taze | frais | fresh |
| belg | yaprak | feuille | leaf |
| xêvet | büyük çadır | grande tente | large tente |
| kon | çadır | tente | tente |
| vîn | îrade | volonté | will |
| şên | kudret, iktidar | pouvoir | power |
| ala | bayrak | étendard, drapeau | flag, standard |
| durû | ikiyüzlü | hypocrite, faux-jeton | hypocritical |
| qerd | maymun | singe | monkey |
| zengil | çan | cloche | bell |
| dojeh | cehenem | enfer | hell |
| perestin | ibadet | adoration | adoration, worship |
| sertilî | başparmak | pouce | thumb |
| mîdad | murekkep | encre | ink |
| lengî | topal | boiteux | lame |
| verêhtin | boşaltmak | vider, verser | to pour, to empty |

PEYVÊN

# Dîwana Tîrêj

*Amadekar: Zinar SORAN*

| kurdî | tirkî | fransizî | îngilîzî |
|---|---|---|---|
| heyam, dem, dewr | devir, çağ, dönem | temps, époque, période | time, epoch, period |
| geşt, ger | seyran, kır gezintisi, piknik | promenade à la campagne | walk, stroll in countryside |
| lenger | 1) köprü ayağı 2)çapa demiri | 1) pilier d'un pont 2) ancre | 1) pillar 2) anchor |
| koh, çiya | dağ | montagne | mountain |
| pesar, berpal | bayır, yamaç | côteau | hillside, slope |
| panav, deşta bilind a rast | yüksek ova | plateau (de montagne) | plateau |
| lat | masif kaya, uçurum | rocher, précipice | rock, chasm |
| xunav | çişeleme, çiy, şebnem | rosée | dew |
| çirisandin | ışıldatmak | faire luire | to polish, to shine |
| çirisîn | ışıldamak | luire, étinceler | to gleam, to shine |
| perwaz | kanat çırpma, uçuş | envol, battement d'ailes | flight, taking wing |
| lek | 1) 10.000 kişi 2) küme | 1) 10.000 individus 2) foule | 1) 10.000 peuples 2) crowd |
| cobar | dere | ruisseau, cours d'eau | stream, brook |
| bestîn | bağlamak | attacher, lier | to bind, to tie up, to link up |
| sîpah | ordu | armée | army |
| çilak | ince uzun değnek | baguette fine et rectiligne | rectilinear stick |
| çilakî | ince uzun | droit, rectiligne | straight |
| vîn, viyan | irade, istek | volonté | will |

| | | | |
|---|---|---|---|
| şeg | değnek, hokey değneği | baguette, crosse de hockey | hockey stick |
| helestin, rabûn | kalkmak | se lever | to wake up |
| hedan | sabır | patience | patience |
| sawêr | hayal | imagination | imagination |
| şermîsar | mahcub | honteux, humilié | shameful, ashamed |
| mişt | silme dolu | à ras bords | to the brim |
| piyam, peyam | mesaj | message | message |
| destbeste | elpençe | soumis le doigt sur la couture | fully obedient |
| geda | dilenci | mendiant | beggar, mendicant |
| qaş (kevirê bi qîmet) | yüzük taşı | pierre sertie | precious stone, gem |
| nigîn, gustîl | yüzük | bague | ring |
| rewa | nem | humidité | humidity, dampness |
| qad, cî, meydan | meydan, alan | place, champ | place, field |
| şehneşîn | balkon | balcon | balcony |
| zernegar | altın işleme | brodé d'or | embroidered with gold |
| şeng | canlı | vivant, plein de vitalité | lively, vivid |
| pêjin, dengê kerr | hisetme, gürültü, yankı | signe, signal, bruit, écho | sign, signal, noise, echo |
| pejina te nayê | senden haber yok, görünmüyorsun | tu ne donnes pas de signe de vie | there is no news from you |
| kalan | kılıf | fourreau, gaine | sheath |
| dax | dağlama | cautérisation | cauterization |
| çeleng | çevik, çalışkan, canlı | agile, vif, leste, diligent | agile, nimble, sprightly |
| êl | boy, il | tribu | tribe |
| koçemal : tevahiya malê | ailenin tümü | toute la famille | all family |
| nik, cem, ba | nezdinde, yanında | chez | at, in |
| kavil | virane, harabe | ruine | ruin |
| tak û tûk, yekoyek | tek tük | rarement | rarely |
| pepûk | guguk kuşu | coucou | cuckoo |
| pertew, şewq, tîrej | ışın | rayon | ray |
| jana zirav | verem | tuberculose | tuberculosis |
| kovî | yabanî, evcilleştirilmemiş | sauvage, non domestiqué | sauvage wild |
| pêxwas | baldırı çıplak | va-nu-pieds | tramp |
| guft û goy | sohbet | causerie, conversation | talk, chat, conversation |
| tax | mahalle | quartier | quarter, neighbourhood |
| tevger, bizav | hareket | mouvement | movement, motion |
| pêşewa | önder | leader | leader |
| serwer | ulu önder, hükümdar | souverain | sovereign |
| rav, 1) nêçîr 2) sef | 1) av 2) saf | 1) chasse 2) rang | 1) hunting 2) row, line |
| kam | dilek, arzu | désir | desire |
| xifş, ximş, karxezal | ceylan yavrusu | faon, daguet | fawn, brocket |
| xûz | kambur | bossu | hunchbacked |
| nependî | gizli | en cachette | on the sly, secretly |
| xeml û xêz | zinet, süs eşyası | parure, ornement | ornament, jewels, finery |
| qûntar | dağ eteği | flanc de montagne | slope |
| berpal | bel | versant de coline | hillside |
| baq | demet | bouquet | bunch |
| hov | vahşi | sauvage, fauve | wild, wildcat |
| rêç, şop | iz | trace | track |
| pîkolî, pêkolî | eşeleme | action de piaffer | stamp |
| pêkolî kirin | eşelemek | piaffer | to stamp, to paw the ground |
| kêl, kevirê çikandî | dikili taş, mezar taşı | borne, pierre tombale | milestone, tombstone |
| kotek | zor | force, coercition | coercion |
| şevgêr | harami | brigand opérant la nuit | brigand acting by night |
| ban | dam | toit | roof |
| liq | şube | section, branche | section, branch |
| rex | donanım | agrès, cartoucherie | apparatus, cartridge belt |

| | | | |
|---|---|---|---|
| bîdar, şiyar | uyanık | éveillé, vigilant | awake, vigilant |
| dilawer, dilêr | yiğit | brave, vaillant | brave, valiant, galant |
| hêvisîn | nakış işlemek | broder | to embroider |
| çogan, darê gogê | polo değneği | crosse | crook, crocier, stick |
| vajî | ters | envers, à l'envers | wrong side, inside out |
| çox | çuha | drap | woolen cloth |
| kemxa | bir nevi ipek kumaş | soie de Damas | silk of Damascus |
| mexmer | kadife | velours | velvet |
| mircan | mercan | corail | coral |
| şêrgele | aslan sürüsü | troupeau de lions | herd of lions |
| têz | çakmaklı tüfeklerde ateşleme fitili | mèche du briquet de fusil | wick of a rifle |
| şewl | fundalık | broussailles | brushwood |
| pişk | kura, nasib | lot, part | prize, share, lot |
| pişk avêtin | kura çekmek | tirer au sort | to draw lots |
| best | heves, ilham | inclination, désir, inspiration | desire, inclination, inspiration |
| salar | baş kumandan | commandant en chef | commander in chief |
| serbaz | er, nefer | soldat | soldier |
| darsêpî | sehpa, idam sehpası | gibet, potence | gallows |
| arbeşk | çakmak taşı | silex | flint |
| axivîn | depreşmek | récidiver (maladie) | to recur |
| deliyan | kamaşmak | s'éblouir | to bedazzle |
| terez, zîpik | dolu | grêle | hail |
| bahoz | fırtına | tempête | storm, tempest |
| hilmiştin, rapêçayin | çemremek | se retrousser | to hitch up, to turn outwards |
| bengîn | tutkun, sarhoş | amoureux passioné | passionate |
| kelax | leş | charogne | carrion |
| gornebaş | bir sırtlan cinsi | une variété de hyène | a variety of hyena |
| keftar | sırtlan | hyène | hyena |
| sermed | ebedi | éternel | eternal |
| sermedî | ebediyet | éternité | eternity |
| pêwend | bağ, ilgi | lien, liaison, relation | link, linkage, relation |
| qirş û qal | çer çöp | brindilles | twig |
| moran | pus | brouillard | fog, mist, smog |
| çepel | çirkin | laid | ugly |
| şabaşî | şükür, ikram | grâce, louange | praise, grace |
| ceban | mezarlık | cimetière | cemetery |
| hoşîn | sendelemek | tituber | to stagger |
| delav | yalak | abreuvoir | watering place |
| rewrewk | gözleri kararma, sanrı | hallucination | hallucination |
| hilçinandin | 1) çekip koparmak<br>2) örmek onarmak | 1) extirper<br>2) ravauder, repriser | 1) to eradicate, to extirpate<br>2) to darn |
| sergerdan | şaşkın, başı dönen | étourdi, désorienté | heedless, scatter brained |
| zîtin | eğirmek | filer | to spin |
| peng | iplik çilesi | écheveau | skein, hank |
| gilde | yumak | pelote | (wool) ball |
| keşkûl | keşkül, dilenci çanağı | obole | mite, offering, obol |
| gezo | kudret helvası | manne, exsudation végetale | manna |
| temara mirinê | ölüm uykusu | sommeil de la mort | deep sleep |
| rêl | küçük orman | bois | wood |
| berokaş | yokuş yukarı | pente ascendante | uphill |
| şîp | iniş, çağlayan | chute d'eau, cascade | waterfall, cascad |
| babîsok, babelîsk | hortum | tourbillon | whirlwind |
| bagêr | kasırga | ouragan, bourrasque | hurricane, storm |
| nirx | narh, değer | prix, valeur | price, value |
| hok: girêka ku vebûna wê hêsan e. | çözülmesi kolay düğüm | nöud facile à défaire | knot easy to undo |

| | | | |
|---|---|---|---|
| îşk*, îşk dan | sıkıştırmak (yük) | comprimer, presser | to squeeze, to press |
| gulî | püskül | houppe | tassel, tuft |
| rîşî | saçak | frange | fringe |
| mexmer: elba mezin a darîn | tahtadan yapılmış büyükçe kap | grand récipent en bois | large wooden bucket |
| navkil, kêrî | yayık germe tahtası | baguette servant à tendre la baratte en outre de chèvre | stick which serves to brace a goatskin used as churn |

------------

* îşk : darê ku pê piştiyek, barek tê şidandin.

# Termên rêzimanî

| **kurdî** | **tirkî** | **fransizî** | **înglîzî** |
|---|---|---|---|
| termên rêzimanî | gramer terimleri | termes grammaticaux | Grammatical terms |
| alfabe, f. | alfabe | alphabet | alphabet |
| tîp, f. | harf | lettre | letter |
| girdek, f. | büyük harf | majuscule | Capital (letter) |
| hûrek, f. | küçük harf | minuscule | small letter, lower case |
| dengdar, f*. | ünlü, sesli | voyelle | vowel |
| dengdara dirêj, f. | uzun ünlü | voyelle longue | long vowel |
| dengdara kurt, f. | kısa ünlü | voyelle courte | short vowel |
| bêdeng, f. | ünsüz, sessiz | consonne | consonant |
| dudeng, f. | iki ünlü, diftong | diphotngue | diphtong |
| sêdeng, f. | üçünlü, triftong | triphtongue | triphtong |
| kîte, f. | hece | syllabe | sylabble |
| yekkîte, f. | tek heceli | monosyllabe | monosylabble |
| dukîte, f. | iki heceli | dissyllabe | disylabble |
| sêkîte, f. | üç heceli | trisyllabe | trisylabble |
| kîtandin | hecelemek | épeler, syllabe par syllabe | to spell syllabble by syllable |
| pirkîte, f. | çok heceli | polysyllabe | polysyllable |
| tîpandin | harfi harfine yazdırmak | épeler lettre par lettre | to spell leter by letter |
| ra, f. | kök | racine | root |
| rader, m. | masdar | infinitif | infinitif |
| bêje, peyv, f. | sözcük, kelime | mot | word |
| bêjeya guhêrbar, f. | değişken sözcük | mot variable | inflectional word |
| bêjeya neguhêrbar, f. | değişmez, değişken olmayan sözcük | mot invariable | unvariable, uninflectional word |
| bêjeya sade | yalın sözcük | mot simple | simple word |
| bêjeya hevedudanî | bileşik sözcük | mot composé | compound word |
| pêşdanî, f. | önek | préfixe | prefix |
| paşdanî, f. | ardek | suffixe | suffix |
| eyletbêje, f. | sözcük topluluğu | famille de mots | words family |
| serbixwe | bağımsız | indépendant | independent |
| serbixweyî | bağımsızlık | indépendance | independence |
| piçûkker | küçültücü | diminutif | diminutive |
| erînî | olumluluk | affirmative | affirmative |
| neyînî, f. | olumsuzluk | négation, négative | negative |
| hevedudanî, f. | bileşik | composé | compound |
| hevmane, f. | eşanlamlı | synonyme | synonymous |
| hevdeng, m. | eşsesli | homonyme | homonymous |
| dijmane | karşıt anlamlı | antonyme | antonymous |
| devkî | sözlü | oral | oral |
| nivîskî | yazılı | écrit | in writing |
| nimûne | örnek | exemple | example |

| | | | |
|---|---|---|---|
| rêziman | gramer | grammaire | grammar |
| rêzimana kurdî | Kürtçe grameri | grammaire kurde | Kurdish grammar |
| navdêr, m. | isim (grammer) | substantif | noun, substantive |
| nav, m. | isim | nom | name |
| serenav, m. | özel isim | nom propre | proper noun |
| hevenav, m. | cins isim | nom commun | common noun |
| komenav, m. | nom collectif | topluluk ismi | collective noun |
| navê hevedudanî, m. | bileşik isim | nom composé | compound noun |
| jimar | sayı | nombre | number |
| jimarnav, m. | sayı adı | numéral | numberal |
| tekane, m. | tekil | singulier | singular |
| pirane, m. | çoğul | pluriel | plural |
| zayend, f. | cins | genre | gender |
| mê, f. | dişil | féminin | feminine |
| nêr, m. | eril | masculin | masculine |
| nêtar, f. | nötr | neutre | neuter |
| nêtari, f. | nötrlük | neutralité | neutrality |
| rastnivîsîn, f. | imla | orthographe | orthography |
| spehînivîsîn, f. | güzel yazı yazma sanatı | calligraphie | calligraphy |
| tof, f. | grup, küme | groupe | group |
| awa, m. | hal, durum | cas | case |
| tewandin, f. tewang, f. | büküm | déclinaison | declension |
| tewandin (bitewîne !) | bükümlemek | décliner | to decline |
| kes, m. | şahıs | personne | person |
| kesê yekemîn | birinci şahıs | première personne | first person |
| kesê duwemîn, m. | ikinci şahıs | deuxième personne | second person |
| kesê sêyemîn, m. | üçüncü şahıs | troisième personne | third person |
| rengdêr, f. | sıfat | adjectif | adjective |
| rengdêra çawahîn, f. | niteleme sıffatı | adjectif qualificatif | qualifing adjective |
| rengdêra nîşandanê, f. | işaret sıfafı | adjectif démonstratif | demonstrative adjective |
| rengdêrra jimarîn, f. | sayı sıfatı | adjectif numéral | numeral adjective |
| rengdêra pirsiyarkî, f. | soru sıfatı | adjectif interrogatif | interrogative adjective |
| pronav, m. | zamir | pronom | pronoun |
| pronavê kesîn, m. | şahıs zamiri | pronom personnel | personal pronoun |
| pronavê pirsiyarkî, m. | işaret zamiri | pronom interrogatif | interrogative pronoun |

* Di xebatên xwe yên rêzimanî de Mîr K. A. Bedir Xan *dengdar* ji bo *bêdeng* ango bîseda ya farisî [(t) : sessiz, (f) : consonne] bi kar aniye û ji bo *sedadar* a farisî [(t) ünlü, (f) voyelle] jî *dengdêr,* dixebitîne. Ji ber pêşî li tevliheviya navbera *dengdar/dengdêr* bê girtin û ji bo bikarin van mefhuman bi awayekî sadetir bi zarokên kurd bidin hîn kirin, Civîna ziman termên jorîn helbijart.

**JI KLASÎKÊN KURDÎ**

# Ferhengoka Dîwana Cegerxwîn

-II-

*Amadekar* : Khosrow ABDOLLAHÎ

| *kurdî* | *tirkî* | *fransizî* | *îngilîzî* |
|---|---|---|---|
| **kulah**: kum | külah | bonnet | cap, bonnet |
| raborî | geçmiş, mazı | passé | past |
| şax: çiya | dağ | montagne | mountain |
| diyar: bilindahî | yükseklik | hauteur | height |
| fexfexe: xwe nepixandin | övünme | pavanement, fanfaronade | strutting about, bragging |

| | | | |
|---|---|---|---|
| devlok: kesê ku dev davêje her kesî | ısırıcı, herkese dil uzatan | qui agresse tout le monde | aggressive towards everyone |
| lewleb: destikê meşkê: çerxa felekê | felek çarkı | roue de la Fortune | fate |
| çikûs: tima | cimri | avare | miserly, stingy |
| mehder: şefaet | şefaat | clémence | clemency, leniency |
| şebnem: xunav | şebnem | rosée | dew |
| rekeh: qefes | kafes | cage | cage |
| qelêr: qilêr, qirêj | kir | saleté, crasse | dirt, filth |
| lehî: lêwî, laser, sêlav | sel | torrent | torrent |
| pereng: 1) hevrîşimê pir sor ê ku dibiriqe, 2) bizot | 1) kızıl ipek 2) köz | 1) soie rouge 2) braise | 1) red silk 2) embers |
| pêkve: bihevre, hemî | birlikte | ensemble | together |
| kepen: qeyd û zincîr, lele, toq û zincîra giran ku dixin stûyê mehkûman | mahkumların boynuna takılan ağır zincir | chaîne lourde portée au cou par des condamnés | heavy chain put around the neck of prisoners |
| kortal | uçurum, dipsiz derinlik | abîme | chasm, abyss |
| xurd, par | pay | lot, part | share |
| saw: tirsa mezin | dehşet | frayeur, terreur | fright, terror |
| reş û peş | korkuluk | épouvantail | scarecrow |
| reş û peş kirin, çav tirsandin | ürkütmek | brandir l'épouvantail | to scare |
| serpêl: heqîr, bêxîret | ürkek, haksız-lıkları kabul eden, hakir | indigne, vil | vile, infamous |
| gerdûn: kaînat | evren | univers | universe |
| xar: kelem | diken | épine | thorn |
| lewçe: çenebaz | geveze | bavard | talkative |
| tolaz: jinbaz, çavlider | hovarda | coureur, libertin | womanizer, woman-chaser, libertine |
| zugurt: 1) bê jin 2) bê mal û bê dirav, bê çare, reben, rahib | 1) bekar 2) parasız 3) rahib | 1) célibataire 2) sans fortune 3) moine | 1) bachelor 2) penyless 3) monk |
| stembar : yê ku stem û zilm dikşîne | mazlum | opprimé, persécuté | oppressed, persecuted |
| paçîk: perçeyekî nerm ê piçûk, potik | bez parçası | pièce de toile, de tissu | piece of material, of cloth |
| şerîpan bûn : | savaşmak | se battre | to figth |
| bejî : yabanî, ne avî | yabani, sussuz | sauvage (plante) | wild, savage |
| sîm : zîv | gümüş | argent | silver |
| dasî : parsûyên masiyan | kılçık | arête d'un poisson | fishbone |
| noq | dalma | plonger, plongée | dive, diving |
| noq bûn | dalmak | plonger | to dive |
| noqar | dalgıç | plongeur | diver |
| qulebaz : fêlbaz, fenek | üçkağıtçı | intrigant | schemer |
| **jêder** : çavkanî | memba | source, origine | source, origin |
| **gerd** : mezin, giregir | büyük, eşraf | grand, notable | notable, impressive |
| **tore** : edeb, terbiye | terbiye | education | education |
| **bengîn** : bi evîna | aşık, tutkulu | amoureux | enamored, passionate lover |

| | | | |
|---|---|---|---|
| kesekî dîn bûn | | passionné | |
| bengînî | tutku | passion | passion |
| mihrecan | festival, | festival | festival |
| wefd, *nm* | heyet, delegasyon | délégation | delegation |
| merbend : | ayaklara vurulan | chaîne mise | ankle chain |
| qeyda ling | zincir | aux pieds | |
| qaçûr, qemçûr | hayvan vergisi | impôt prélevé sur le bétail | tax levied on livestock |
| hêtûn: kûreya kilsê | demirci ocağı | forge (de forgeron) | blacksmith's forge |
| an hesinkeran | | | |

— péhlevan: ji gotina îranî pehle, şehir, bajar tê, pehlevan kesê ku bajar diparast, ku mêr û mêrxas bû, jê re digotin.
şeraba kamiranî: şeraba bexteweriyê, şeraba ku mirov dighîne miradê xwe
— li hember hev bûn: şerê hev kirin
— bej : erdê bê av, reşahî
— şût : 1) kone, fenek 2) rût, tazî

# Ferhengok

*Reşo ZÎLAN*

Kovara kurdî ya bi navê ***Stêr***ê, di navbera salên 1943 - 1945-an de, wek paşkoya (servehî) salane ya rojnameya ***Roja Nû***, li Beyrûtê hatiye çap kirin. Herwekî tête zanîn, rojnameya ***Roja Nû***, rojnameyeke hefteyî bû û di navbera salên 1943-1946-an de li Beyrûtê dihate weşandin. 73 hejmarên rojnameya ***Roja Nû*** ronahî dîtine. Xwediyê hem ***Roja Nû*** û hem jî ***Stêr***-ê mamostayê payebilind û zaneyê nemir rehmetî Mîr Dr. Kamiran Alî Bedirxan bû.

Li ser hev 3 hejmarên ***Stêr***-ê derketine. Hejmara 1-an di 6.12.1943-yan de, hejmara 2-yan di 28.2.1944-an de û hejmara 3-yan jî di 22.10.1945-an de hatine weşandin. Hemû hejmar di yek mezinahiyê de, ango di formata A3-ê (297x420 mm) de û 4 rûpel in. Kovar bi xwe wênedar e û wêneyên wê reş û spî ne.

***Stêr*** bi xwe, bi kurdiya zaravayê kurmancî ye û herwekî diyar e, bi kurmanciyeke bilind, edebî, spehî û bedew hatiye nitirandin. Heçî mijarên kovarê ne, mijarên giştî û gelemperî ne. Tevî ku mijarên giştî beşeke girîng ya kovarê pêk tînin, tê de nivîsarên zargotinî û edebî jî ne kêm in.

Ferhengoka jêrîn, ferhengokeke pir piçûk ya peyvên nû, yan jî peyvên jibîrçûyî, windabûyî, nadir û kêmpeydabûyî ne. Ji bilî vê, me peyvên ku ji aliyê rastnivîsîna zaravayê kurmancî de girîngiyekê berpêş dikin jî êxistine ferhengokê. Me li beramber peyvên holê bi tenê «*Rastnivîsîn!*» daniye û bi vî awayî xwastiye bala xwendevanan bikişînin.

**Mirarî**: mirwarî, durr, lû'lû'; kevirekî rengsedef û giranbiha ye. (t) *inci* (f) *perle* (e) *pearl*
**Çarnikar**: çarkenar, çarmedor, çaralî, çarhêl, çarhawêl, çarrex
**Kû der**: *rastnivîsîn!*
(Bi şewq û) **bîn**: (bi şewq û) bînîn
**Şanî dan**: nîşan dan, nimandin, raber kirin
**Pêş kirin**: nîşan dan, nimandin, raber kirin
**Pevregirêdayî**: yekker, yekpare, bihevregirêdayî
(Ev mezinên) **he**: (ev mezinên) han
**Sermiyan**: = semyan: serek
**Dirêjî** (neyaran) **bike**: êrişî (neyaran) bike
(Bi hêvî û) **niyaz**: (bi hêvî û) lava
**Bi hafa** (yekî ketin): bi diyarî (yekî ketin)
**Nazenîn**: nazdar
**Şaristan**: 1. welat 2. bajar, şar, şehr
**Derêxistin**: derxistin
**Bend**: meqale
**Nivîsevan**: nivîser, kesê xwedî jêhatin û qabiliyet ku dikare bend yan jî pirtûkan binivîse. Heçî peyva «nivîskar» e, ne bi vê maneyê ye. Ew bi maneya kesê ku şol û karê wî nivîsandin e, bi karê nivîsînê ve bilî dibe, ango sekreter yên ku di nivîsgeh û buroyekê de kar dikin.
**Sername**: sernivîs, navê bendê
**Xebatker**: kedkar
**Xwe kar kirin**: xwe amade kirin
(Çek û) **posat**: (çek û) techîzat
**Qirên**: şer, pevçûn

**Gerandin**: bi rê ve birin, îdare kirin
**Berberî**: şer û neyarî
**Bergeh**: 1. dîmen, menzere 2. horîzont, aso, ûfiq 3. perspektîv 4. menzîl, mesafe
**Gerew**: barimte, rehîne
**Kûrahî**: *rastnivîsîn!*
**Lê hûr nêrîn**: lê hûr bûn, bi hûr û kûrahî li dabaşekê nihêrîn û ew ders kirin.
**Pêşçavan kirin**: nîşan dan, nimandin, raber kirin
**Gerînende**: serkar, mudir
**Mirovdewlet**: mirovên xwedî zanyariyên dewletbirêvebirinê
**Çîrêdestî**: berhema destên hunermendekî
**Mermertiraş**: kesê ku mermeran ditiraşe û jê tiştekî diafirîne
**Nûve**: îcad, tiştên nû hatine dîtin û îcad kirin
**Nûvekar**: mûcîd, kesê ku tiştekî nû îcad kiriye
**Kûrerastî**: rastî û heqîqetên kûr
**Bilindtir**: *rastnivîsîn!*
**û h.w.d.**: Û her wekî din, û hwd
**Destnîgar**: resam
**Nîgarandin/nîgarîn**: resim kirin
**Qesirbend**: koşkbend, kesê ku ji avakirina koşkan beşer dike
**Avahîgeh**: cîhê ku avahî lê hene
**Zîz**: hesas
**Hişyar**: *rastnivîsîn!*
**Ev pênc sal in**: *rastnivîsîn!*
**Papor**: Keştiyên ku bi buxarê dixebitin
**Çelê erbîniyê**: = çelê ’erbe’îniyê: çelê erebî, çelê giran
**Perde vegirtin**: perde kişandina di navbera du tiştan de
**Xame**: qelem
**Daketin erdê**: danîn erdê (ji bo çûk û balafiran)
**Mamoste**: dersdar, mu’elim
**Hevalbend**: mutefîq
**Pereyên xwe**: *rastnivîsîn!*
**Niha**: *rastnivîsîn!*
**Dot**: keç
**Lewitîn**: pîs bûn
**Xwe bera avê da**: xwe berda avê, xwe avêt avê
**Qîrker**: telal. *«Agir ket mala qîrker, kesî bawer nekir».*
**Arî**: Xweliya şewitî. *«Ariya ber tifika xwe nadim birinca xelkê».*
**Topên balafirşikên**: ew celeb çek e ku mirov pê şerê balafiran dike û wan dide erdê.
**Pertaw**: = pertew, perto: tîrêj
**Hawîr**: komek kesên ku bi eynî pirs û babetê ve mijûl dibin.
**Çandinî**: ziraet
**Devî**: devîçirk, tûm, kem, kurs,darkolik, teraş, dirî, hejik, pûte
**Ber pê diçû**: ber bi wî diçû
**Weşînek**: weşandina bernameyekê bi riya radyo yan jî televîzyonê
**Civangeh**: cîhê ku mirov civanê dide hev û hevûdu lê dibîne, cîhê civanê, cîhê randevûyê, cîhê hevûdu dîtinê
**Serhoste**: hosteyê ku serektiya hosteyan dike û serekê wan e.
**Hostekar**: hoste
**Bihingeh**: cîhê ku mirov xwe lê vedihesîne û îstirehet dike.
**Dagerîn**: vegerîn
**Şikênandin**: şikinandin, şehandin, şeh kirin
**Nesaxî**: nexweşî
**Pengav**: cîhê ku av tê de pengiviye
**Xarê mîhan**: keriyê mîhan
**Boşê dewan**: keriyê hêştiran, keriyê deveyan
**Nijdeyê hespan**: keriyê hespan
**Berxurdar**: pardar, behredar
**Hatinên erdê**: dahatên erdê.

## FERHENGOKA

# Memê Alan

*Amadekar* : Mehmed UZUN

| *kurdî* | *tirkî* | *fransızî* | *îngilîzî* |
|---|---|---|---|
| mifte, kilît | anahtar | clé | key |
| bergîr, hespe baran | beygir | cheval de trait, cheval de labour | packhorse |
| xezîne, define, gencîne | hazine | trésor | treasure |
| sûk, çarşî, bazar | çarşı, bazar | marché | market |
| havîngeh | yazlık konut | résidence d'été,<br>lieu d'estivage | summer residence, holiday resort<br>cattle's summering area |
| mîrasxwar, mîratxwir | mirasçı | héritier | heir |
| haşer û maşer : roja qiyametê | kıyamet günü | jour du Jugement Dernier | Last Judgement Day |

| | | | |
|---|---|---|---|
| xulîn : dengê avê | su sesi | murmure de l'eau | murmur |
| delîlê heyiriyan : rêberê bêçareyan | çaresizlerin rehberi | guide des infortunés | guide of the wretched |
| dehiye : qurban | kurban | sacrifice, victime | sacrifice, victim |
| hermet : xanim | hanım | dame | lady |
| tenbî : qewîtî | tembih | recommandation, avertissement | recommendation warning |
| şalûl | baştankara | mésange | tit (mouse) |
| qonax : menzîl | mesafe, konak | étape, relais | stop, stopping place |
| kokim : kal | yaşlı | vieux, vieillard | old |
| galegot : şayia | söylenti | rumeur | rumour |
| kuriyê behre : caniyê kûvî yê behrê | denizaltı | hippocampe | hippocampus |
| serac : kesê ku zînan çêdike | saraç | sellier | saddler |
| çîn : neqş | nakış işleme | broderie, ornement | embroidery, ornament |
| şewla rojê : tîrêja roja | güneş ışını | rayon de soleil | ray |
| lîwan : hesinê gemê | gem | mors | bit |
| lewend : bedew û bi bejn û bal | yakışıklı | beau, élancé, de belle allure | beautiful, slender, good-looking |
| perwaz : fir | uçuş, uçma | vol | flight |
| wexm : bîhna nexweş, wexmê miriyan | kötü koku, ölü kokusu | odeur de putréfaction, puanteur | stink, stench |
| çêlikê şêran : têjikê şêran | aslan yavrusu | lionceau | lion cub |
| stêle : musteheq, layiq | layık | digne | worthy of, deserving |
| avaker | imar eden, mimar | batisseur | builder |
| ferş : teht | döşeme taşı | dalle de pierre | stone slab |
| simsimî | benekli | tacheté, tavelé | spotted, dotted, speckled, packmarked |
| mêrkuj | katil | assassin | assassin, murderer |
| navkêl | bel | reins | kidneys |
| gûş, goşe | köşe | coin, angle | corner |
| sergewer : malmezin, torin | asilzade | noble | noble |
| hênijîn | uyuklamak | somnoler, s'assoupir | to doze, to snooze, to feel drowsy |
| perwa : tirs | korku | peur | fear |
| bêperwa | korkusuz | intrépide, preux | intrepid, valiant |
| dilketî | aşık | amoureux | in love, person in love |
| kir, kirin | eylem | acte, action | act, action |
| tem | niyet, arzu | désir, intention | desire, wish, intention |
| tem kirin | niyet etmek, arzu etmek | désirer, avoir l'intention de | to desire, to wish, to intend to |
| lezgîn | çevik | agile, leste, alerte | agile, nimble, alert |
| binanî ; devê tûjê şûr | kılıcın keskin ağzı | le fil de l'épée | the edge of the sword |
| qonç : boçik | potinin çekilen uzantısı | la tige de la botte | boot's let |
| pêda pêda : berebere,peyderpey | peyderpey, giderek | petit à petit,progresivement | little by little, progressively |
| eylo | kartal | aigle | eagle |
| çilka baranê : dilopa baranê | yağmur damlası | goute de pluie | rain's drop |
| şapik | pantalon | pantalon | trousers, pants |
| gengaz : hêsan | kolay | facile | easy |
| rivên : rivîn, pêtî | alev | flamme | flame |
| şadimanî, şahî | sevinç, şenlik | joie, liesse, fête | joy, jubilation, celebration |
| kok : xeml, xweçêkirin | süsleme | toilette, maquillage | toilet, make-up |
| xwe kok kirin | süslenmek, güzelleşmek | se faire beau, se maquiller | to get spruced, to make-up |
| talaz : toz | toz | poussière, détritus | dust, rubbish, refuse |
| berger : kesê ku li ber digere | rica eden, yalvaran | suppliant | supplicant |
| reml, fal | fal | bonne aventure | fortune |
| remldar: kesê ku remlê davêje | falcı | diseur de bonne aventure | fortune-teller |
| keviya avê : kenarê avê | su kenarı, sahil | le bord de l'eau | water's edge |

| | | | |
|---|---|---|---|
| avan | yardakçı | courtisan, flagorneur | flatterer, fawner |
| serdilk | aziz, sevgili | favorite, chérie | favorite, beloved, cherished |
| girgîn | azgın, öfkeli | furieux, emporté | furious, hot-tempered |
| liyan | zayıf, acılı | faible, meurtri | weak, wounded |
| bodek, ehmeq | budala | idiot, stupide | idiot, stupid |
| gurr : gef û gurr | tehdîd | menace | menace, threat |
| gef û gurr dan | tehdit etmek | menacer | to threaten |
| ebeboz : pêxwas | lumpen | voyou | hoodlum, hooligan |
| ebabelek : fesad | fesatçı | intrigant | scheming |
| hêl : qewet, hêz | güç | force, puissance | strength, power |
| bi hêl, bi qewet | güçlü | puissant, fort | powerful, strong |
| ji hêl ketin | bitkin düşmek | être à bout de force | to be exhausted, to be at the end of one's tether |
| mehfûr | halı | tapis | carpet |
| pêrçenk : şevşevok | yarasa | chauve-souris | bat |
| hişmetkar : heyran | hayran | admiratif | admiring |
| hişmetkar mayin | hayran kalmak | être admiratif, admirer | to admire |
| bêtar: gelek zêde, felaket | fazla, haddinden fazla | excessivement, terriblement | excessively, terribly |
| meqet : mînder | minder | coussin | cushion |
| kelîşo : cilşo | çamaşırcı | laveuse, femme qui fait la lessive | washerwoman |
| mihrîvanî : dilovanî | şefkat, muhabet | tendresse, affection, clémence | tenderness, affection, clemency |
| bijî | yele | crinière | mane |
| bijiyê şêran | aslan yelesi | crinière du lion | lion's mane |
| mekarî : dek, fêl | hile | ruse, intrigue | guile, trickery |
| tiling : dêl | kancık | chienne (insulte) | bitch |
| dûşk : diş | baldiz | belle-sœur | sister in law |
| dimik : serê nikil | gaga ucu | le bout du bec | tip of beak |
| xewle | tenha | isolé, à part, aparté | aside |
| xewle kirn | özel görüşmek | faire un aparté | to have a private talk |
| meterîs : sîper, çeper, kozik | siper | tranchée | trench |
| lek | 10.000 | 10.000 | 10,000 |
| derbest, çardar | sedye | brancard | stretcher, shaft |
| kuşim | alay | moquerie | mockery |
| li kesekî kuşim kirin | biriyle alay etmek | se moquer de quelqu'un | to make fun of s.o. |
| seypisan : kuçikbav | köpekoğlu | fils de chienne | son of a bitch |
| pabûsî : pê maç kirin | ayak öpme | baisser le pied | to kiss the feet |
| pêlepaş : berepaş | geri geri gitmek | à reculons | backwards |
| lehîzvan, lîstikvan | oyuncu | joueur | player |
| şetrenc : kişik | satranc | échec | chess |
| segman : nîşangirê baş | nişancı | bon tireur | good shot |
| peya, peyar | piyon | pion (échecs) | pawn |
| kiş | mat | échec et mat | checkmate |

**hufefuf** : dengê pelan
**çîrkeçîrk** : dengê ben û şirîtan
**gulabdîn** : xemla zerîn a ku bi şiklê gul de hatine neqşandin
**berbejn** : nivişta ku bi dirêjahiya xwe qasî bejna kesê ku dixwazin ji nezerê biparêzin, li serê ayet ten nivîsîn, dipêçin dikin nav hicabeke ji şima û paşiyê dixin stûye xwe.
**merbend**: hesinê li lingekî hespê dixin û bi singekî ve girêdidin
**qeyd** : hesinê ku pe herdu lingen hespê bi hev re girê didin.
**tûk û gulmit** : qaçil û girêk (ê darekî)
**serhevde** : pozdaxî, eyba kesekî ku dikarin bidin rûyê merivek wî
**berkiş** : di şetrencê de derba berê kişê
**ferzîn** : di şetrencê de wezîr